

# Banga Piştgtiriyê

*Derdora 260 rewşenbîr, siyasetvan û çalakvanên Kurdan ev bang bi zimanê Kurdî û Tirkî imze kirin û ji raya giştî re weşandin. Ewe deqa wê ye:*

**Banga Piştgtiriyê ji bo Gelê Kurdistanê Sûriyê:**

**Serkevtina Me bi Yekirina Hêz û Rêza Me Dibe!**

Ev meseleyên ku îro di cografya Ereban û Rojhilata Navîn de peyda bûne, destpêka wan dighêje hinek rêze peymanên aşkerveşartî yên dema dawî ya Şerê Cîhanê yê Yekem, ku hêzên hevpeyman serkevtiyê wî bûn. Di sala 1920an de, du hêzên emperyal ên wê demê digel du dewletên kevnare yên Rojhilata Navîn, bi hevkarîyê êrîş birin ser Kurdan û warê wan ê kevnare yê dîrokî. Kurdistan, bi van peymanan di navbera dewletên herêmî de (Iraq, Turkiye, Îran û Suriyê) hate parvekirin. Bi vî awayî, hemû mafên ku miletbûna Kurdan diyar dikin, ji wan hatin girtin. Ji ber vê yekê Kurd, di herêmê de wek milleteke bêdewlet a herî gewre, nêzîkê sed sala ne ku têkoşîna bidestxistina mafên xwe yên netewî didomîne.

Di demeke nêzîk de rijîma Beis a Iraqê têkçû û îro jî li hemberê dîktatorîya Beşar Esed û Beisa Sûrî, helwest û berxwedana Kurdan, dê ji bo hilweşandina balansa herêmî û statûqoya heyî bibe pêngaveke dîrokî. Lewre Sûrî di herêmê de xelekeke pir girîng a statûqoyê ye û perçebûna vê xelekê, dê bi xwe re gelek guhartinên nû jî derxîne holê. Ji ber vê yekê, divê em li ser mesela Suriyê û guhartinên di herêmê de helwest û tîfaqa Rûsiya, Îran, Çîn û girûbên li dor û berê wan jî, di vê çarçovê de binirxînin.

Dewleta Sûriyê ya îroyîn, sala 1921an, bi Peymana Londrayê hate damezrandin. Ev

peyman di navbera Firansa û hikumeta nû ya Turkiyê de hatibû imzekirin. Bi imzekirina vê peymanê, Kurdên Bakur û Kurdên Rojavayê Başûr bêrizamendiya xwe ji hev hatine veqetandin û di navbera wan de dîwarên bi sitrî hatin lêkirin. Bi vê awayî Kurdên Rojavayê Başûr ketin bin desthelatdariya Ereben Sûriyê, lêbelê tu demekî ji dawxaza mafên xwe yên rewa û dest ji berxwedan û têkoşînê bernedan.

Sala 1927ê bi beşdarbûna gelek girûbên siyasî yên cûda Partiya Xoybûnê hate damezrandin. Her çiqas bi tevî destpêkirina Şerê Cîhanê yê Duyem, têkoşîn û xebata Xoybûnê dikeve pêvajoyek lawaz û pêre bédengiyek peyda bibe jî, di dawîya salên 1950î de, têkoşîna Kurdan li Sûriyê dikeve pêvajoyeke nû. Partiya Demokrat a Kurd li Suriyê tête damezrandin û Nûreddîn ZAZA dibe serokê wê. Partiyê di bin zixt û zordariya desthilatdariyê de heta Tebexa sala 1960î, bi awayeke aktîf xebata xwe berdewam kir. Ji sala 1961ê şûn ve, li pey hev darbeyên leşkerî pêk hatin û di encam de, hemû mafên komelî yên Kurdan ji dest wan hatin girtin.

Sala 1963an Partiya Beis bi darbeyeke leşkerî desthilatdarî bidest xist. Piştî ku desthilatdarî kete destê Beisîyan, rijîmeke otorîter û zordar hate damezrandin. Li gor bernameya Partiya Beisê, “her kesê li Sûryê dijî Erebe û zimanê wan jî erebî ye.” Piştî vê pêvajoyê dijrabere Kurdên li Sûriyê, şovenîzma erebî û nijadperestiya Beisiyan bêtir bû.

Bi tevî ku nifûsa Kurdên li Suriyê ji nifûsa gelek îmaretên erebî û Ereben Filestinî yên ku di rojê dunyê de ne, zêdetir e jî, li gorî pîlan û armanca ku bi navê “*Kembera Erebi*” tête naskirin, pêvajoya polîtîkayeke tûndrew a erebkirinê dest pê kiriye û rijîma Beisê siyaseta xwe ya *erebkirinê* heta îro domandiye.

**D.R.( 7 )**